Journal of Social Sciences of Mus Alparslan University

anemon

Derginin ana sayfası: http://dergipark.gov.tr/anemon

anemon SOSYAL BİLİMLER DERGİSİ

*Araştırma Makalesi ● Research Article*

# Mar di Mîtolojiya Cîhanê de û di Vebêjên Gelerî yên Mûşê de Marê Ziha*

## *Snake in World Mythology and Marê Ziha in the Muş Folk Narratives*

## *Dünya Mitolojisinde Yılan ve Muş Halk Anlatılarında Marê Ziha*

Şehadet Sarıgül [a,**]

[a] Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı Yüksek Lisans Programı, Muş.

ORCID: 000-0002-9118-1999

AGAHÎYÊN GOTARÊ

*Rabirdûya Gotarê:*
Dîroka serlêdanê: 05 Mijdar 2019
Dîroka sererastkirinê: 11 Berfenbar 2020
Dîroka pejirandinê: 16 Berfenbar 2020

Peyvên Sereke:
Marê Ziya
Mar
Ejderha
Mîtolojiya Cîhanê
Arketîp

KURTE

Di piraniya mîtolojiyên afirandinê de mar û varyasyonên maran gelek caran derdikevin hemberî me. Bi gelemperî hebûna ajalên mîtolojîk li gor taybetmendiya erdnigariyê diguhure. Lê mar ji vê rewşê azad e. Bi vê hebûnê ve gelek erênî û neyêniyan jî di xwe de dihewîne. Ev xebat dê bi teknîka lêkolîna arketîpî, li ser mîtolojiya marên cîhanê û beramberî wê li ser vebêjên ku li Mûşê heyî bisekine. Xebat yê berhevdana vebêjên Mûşê û mîtolojiyên kevnare wek, Misir, Yewnan, Çîn û Îranê bide berhev. Bi vê awayê em ê varyasyonên maran vekolin û li ser taybetmendiyên maran jî bisekinin. Ji ber ku li ser Herêma Mûşê xebateke berhevdana mîtolojîk bi qasî ku em dizanin tune bû, ev mijar hat hilbijartin.

ARTICLE INFO

*Article history:*
Received 26 November 2020
Received in revised form 11 December 2020
Accepted 16 December 2020

Keywords:
Marê Ziha
Snake
Dragon
World mythology
Archetype

ABSTRACT

The serpent and its variations appear in various myths. Often the mythological creatures change the geography, while the snake is free from this situation. Because of this feature, it contains many positive and negative features. This work focuses on world snake narratives in the folk narrativess of Muş with the ancient snake narratives such as Egypt, Greece, China, Iran. In this way the snake is studied differently and its features are emphasized. As far as we know, this issue has been studied since there has not been a mythological comparison study for Muş yet.

MAKALE BİLGİSİ

*Makale Geçmişi:*
Başvuru Tarihi: 26 Kasım 2020
Düzeltme Tarihi: 11 Aralık 2020
Kabul Tarihi: 16 Aralık 2020

Anahtar Kelimeler:
Marê Ziha,
Yılan
Ejderha
Dünya Mitolojisi
Arketip

ÖZ

Birçok yaratılış mitinde yılan ve varyasyonları karşımıza çıkmaktadırlar. Çoğunlukla mitolojik yaratıklar coğrafya özelliklerine göre değişirken yılan bu durumdan azadedir. Bu özelliğinden dolayı yılan, birçok olumlu ve olumsuz özellikleri de kendinde barındırır. Bu çalışma arketipsel araştırma yöntemine göre, dünya yılan mitolojilerinin ve Muş halk anlatıların üzerine yoğunlaşır. Çalışmamız Muş halk anlatılarındaki yılan anlatılarını Mısır, Yunan, Çin ve İran gibi eski yılan anlatıları ile karşılaştırır. Bu şekilde yılan varyasyonları incelenir ve özellikleri üzerinde durulur. Bildiğimiz kadarıyla Muş için henüz mitolojik bir karşılaştırma çalışması yapılmamış olması sebebiyle bu konu çalışılmıştır.

## 1. Dêstpêk

Mar di gelemperiya mîtolojiyan de di rolên cur bi cur de derdikevin hemberî me. Di vê xebatê de yê mar bi lêkolîna arketîpî ya teoriya Carl Gustav Jung ve bê vekolan. Carl Gustav Jung di bingehê de vê têgehê li ser zanista psîkolojiyê ava dike. Pişt re di metoda xwe ya arketîpî de behs dike û dibêje binbîra kolektif û mît malê tevahiya însanan e. Di nav netewên cuda de jî hebûna van xalên hevpar arketîpan derxistiye holê (Erden, 2016: 21). Wek

* Bu çalışma, 22-23 Ekim 2020 tarihlerinde Muş Alparslan Üniversitesinde düzenlenen II. Uluslararası Muş Sempozyumunda sözlü bildiri olarak sunulmuştur.

** Sorumlu yazar/*Corresponding author*.
e-posta: sehadetsarigul@gmail.com

e-ISSN: 2149-4622. © 2013-2019 Muş Alparslan Üniversitesi. TÜBİTAK ULAKBİM DergiPark ev sahipliğinde. Her hakkı saklıdır.
http://dx.doi.org/10.18506/anemon.832142

mînak tirsa li hember şêr. Dibe ku piraniya kesan şêrek nedîtibin jî lê her kesek ji şêr û îhtimala derketina hemberî wan ditirsin, ev dibe tirsa kolektif û arketîpek bi vê awayê tê ava kirin.

Heman tiştê Berna Moran jî dibêje (2003: 220) "C. G. Jung ji bo rexneya arketîpî bûye çavkaniyeke girîng. Mitos ji bo rehên însanî bûye xwediyê binbîreke hevpar ji ber vê yeke jî fikra 'di wêjeyê de dubareyên arketîpî' rêya rexneyên nû vekiriye.

Bi vê teoriye ve em ji bo mîtan nêrîneke nû dest dixin. Ev têgeh berî ewil netew û komên cuda hildide dest û piştre li ser binbîrên wan ên hevpar disekine. Bi vê awayê dixwaze di hin bûyeran de sedema dubareyê çareser bike. Jung van hepariyên ku li komên cuda de derketine wek arketîp binav dike. Her weha arketîp derdikevin holê û dubareyên wêjeyê hin caran bi alikariya vê teorîyê re tê pênase kirin.

Berna Moran jî dibêje ku (2003: 224) "Li gor Jung arketîpên ku di wêjeyê de derdikevin hemberî me, hevpariyên ku di binebîra însanan de heyî ne û gelek ji kurahiya mirovatiyê bang li me dikin. Jung di heman demî de beha binebîra şexsî jî dike. Lê ev ji bûyerên gerdûnî çi qas dûr be binebîra kolektif ew qas gerdûnî ye. Fordham (2015: 29) jî li ser vê mijarê her du têgehên binebîrî ji hev du cuda dike û dibêje binebîra kolektif delîla arketîpên hevpar e ku li gelek cihên cuda wek hev derdikevin hemberî me. Wek Adolf Bastian jî dibêje, em dikarin ji bo vê rewşê bejin 'yekitiya mirovahiyê ya psîşîk'.

Wek ku em dibinin arketîp wek hevpariyên tevahiya însaniyetê tên pênase kirin. Her weha em dikarin bejin ku binebîra kolektîf bi qasî dîroka însaniyetê kevnare ye. Bi vê teoriyê ve me jî xwest ku em îmgeya marê di çandên cuda de bidin berhev û li ser hevpariya vê ajalê bi alîkariya teoriya arketîpî lêkolîn bikin.

Di bingeha xwe de xebata me li ser mîtolojiya mar yên Kurdan û bi taybetî jî yê li ser Marê Ziha bisekine. Berhevdana mîtên maran yê Yewnan, Çîn, Misir û Îran dê bike. Li ser cudahî, wekhevî û hevpariya wan û li ser arketîpîya wan niqaşan bike. Bi vê xebatê ve hem mîtên van çandan dê bê naskirin hem jî berhevdana van lehengên mîtolojik dê bê kirin. Bi qasî ku em dizanin di qada marên mîtolojik de bi taybetî jî li ser herêma Mûşê xebateke berhevdanî nehatiye kirin. Ji ber vê me xwest ku vê kêmasiyê dabin bikin. Xebat bi mîtên kevnare yên Kurdan ve dest pê dike û piştre bi mîtoljiyên din ve berdewam dike.

Armanca lêkolîna arketîpî di mîtolojiyên cuda de lêkolîna piralî ya maran e. Lewra li gor Carl Gustav Jung hevpariyên heman mîtan ji bo neteweyên cuda wek arketîp tên binav kirin. Armanca vê teoriyê jî dixwaze van arketîpên nemir ku ji demên kevnare heya vir ve însanan hildane bin bandora xwe derxe holê. Lewra Carl Gustav Jung (2006: 45) teoriya xwe weha pênase dike;

"Bêyî kesan hişmendiya civakî heye, di encama vê de hişmendiya hevpar derdikeve holê. Ev bûyer ji kes û kûsan bi tevahî dûr in. Bi vê awayê ev bûyer dibin gerdûnî û dibe ku em li her cihî rastî wan mijaran werin."

Mar bi maneya xwe ya ferhengî wek derkevanên xezîneyan û di hin cihên çîrokên afirandinê de wek şeytan derbas dibin. Wisa tê qebûl kirin ku mar piştê sed saliya xwe dibin ejderha (Pala, 2004: 297). Peyva ejderha, Azdahak, Ajdaha, jî ji aliyê binyadî ve Îranî ye. Ejderha piranî di vebêjan, mîtolojiyan, efsaneyan û helbestên epîk de derdikevin hemberî me. Di demên kevnare de marên zede mezin jî wek ejderha dihatin hesibandin (Boratav, 2012: 66). Di van metnên gelerî de piranî wek aferîde û parêzerên av û çeman, ajalên li ser ewran dijîn derdikevin hemberî me. Bi vê awayê ava li ser asîman vala dikin, bereketê li ser rûyê erdê direşînin (Eliade, 2003: 213). Dema mar dibin ejderha ji devê wan agir difure û bi hulma xwe dikarin her cihî wêran bikin. Her weha İskender Pala (2004: 136) dibêje peyva ejderha ji peyva Farisî Aji Dahaka tê, ev jî hukûmdarê Persan Dehhak re têkildar e. Di çavkaniyên cuda de wek malperên ku li ser etîmolojiya peyvan lêkolîn dike de jî ejderha wek ajalek efsûnî û ji aliyê binyadî ve jî wek peyveke Îranî – Farisî derbas dibe. Her weha bi hikumdarê Îranî Azhî Dehak re jî têkiliya peyvê datînin (https://www.etimolojiturkce.com/kelime/ejderha, 13.12.2020). Di hin çavkaniyan de jî ji bo peyva ejderhayê, tê gotin ku "ajî" ji *Avestayê* tê û wateya wê mar e. "Dahak" jî navê mêran e ku di *Şehname*ya Firdewsî de wek hikumdarekî derbas dibe (Aydınlu, 2011). Ev her du peyv ango Ajî – Dahaka (mêrê – mar) peyveke nû afirandiye û bûye Ajdahā (İrde: 13.12.2020).

Eliade (2014a: 215) jî mar û ejderhayan wek sembolên jiyanê pênase dike û şarezatiyê jî bi wan re girê dide. Piranî cihê jiyana wan jî wek der û dora avan pênase dike. Her weha ew mar û ejderan bi arketîpa ji nû ve zayînê ve gire dide. Lewra mar di xwe de hem ab-i heyat û hem jî jehr dihewîne. Taybetmendiyek din jî ev e ku mar ji ber guhertina cermê xwe her tim zinde û ciwan dimîne û ev her du taybetmendî rewşên ji bo arketîpa ji nû ve zayinê berbiçav in. Di gelek mîtan de ji ber şeklê xwe wek sperma hatiye taswîr kirin û ji bo ku xweliyê ser û binê hev dike dibe timsala nûzayîna xweliyê. Her weha bi av û şiliyan re jî tê pênase kirin û ev jî taybetiya heman arketîpê ye (Campbell, 2015: 18).

Ji xeynê vê Carl Gustav Jung (2013b: 22) maran gelek caran bi arketîpa dê re jî têkildar dibîne. Dema jung behsa arketîpa dê dike ev dê nebaş be wan dişibîne mar, ejder yan jî cazûyan (Lilith-Empusa). Sê taybetî ji bo vê arketîpê diyar dike û yek ji van jî tarîtiya wê ya ku di bin erdê de tê dîtin e. Rewşa tarîtiyê, sar û şilorekiyê atfê arketîpa dê dike. Dijberî van tiştan jî atfê nêrtiyê dike. Lewra ev arketîp bi dijberan re hene.

## 2. Mîtolojiyên Cihanê û Vebêjên Marê Ziha

Di mîtên gelerî de mar, gelek caran derdikevin hemberî me. Her çi qas li gor avhewaya erdnîgariyan ajalên mîtan biguhurin jî mar wek lehengek di piraniya erdnîgarî û vebêjan de derdikevin pêşberî me. Bi taybetî jî di çîrokên afirandinê de em mar gelek dibînin. Lewra mar di cihekî de temsîla dijberiyê ye û her weha temsîla jiyanê dike. Di binê vê serenavê de em ê taybetiyên hin maran bibinin û binirxînin.

### 2.1. Mîtolojiya Maran û Marê Ziha Di Vebêjên Mûşê de

Di erdnîgariya Kurdan de gelek mîtolojî û efsane hene. Ev piranî di xalekî de bi mêjûyê mîtolojiya cihanê ve têkildar in. Lewra wek me di despêkê de jî got, argumentên çîrokên mitolojîk piranî hevpar in. Her weha di vebêjên maran de jî

Kurd û Îranî jî digihîjin hevdu. Bi gelek awayên hevpar ev ajal derdikevin hemberî me. Hin caran ev vebêj di bandora mîtan de mabin jî, piranî bi çandî jî xwe parastine. Wek efsaneya Îranî-Kurdî Dehak û Kawayê Hesinkar e ku Firdewsî di *Şehname*yê de vedibêje, Zehhak (Dehak) kurê hukûmdar e û navê hukûmdar jî Mardas e. Li gor riwayetan şeytan dikeve nava laşê Zehhak û bi awayekî dibe serê du maran û li sermilên wî re didin der. Ji bo ku dilê van maran xweş bikin her roj mêjûyê du ciwanan didin wan (Pejman, Semedî, 2016: 144-161). Tişta xerîb ew e ku Firdewsî hin caran wek ejderha behsa van maran dike. Her weha di Zerduştiyê de jî ev fikir qebûl dibine (Çekici, 2019: 1330). Ango em dikarin bêjin ku çîroka mar û ejderhayên Kurdî pişta xwe didin gelek demên kevnare. Wek ku tê dîtin erdnîgarî vebêjên hevpar û kevintir derxistine holê. Her weha em di *Qissehayê Hezar û Yek Şebê* de jî têkî çîroka Şahmeran tên.

Marê Ziha jî yek ji van vebêjên mîtolojîk e ku piranî di derdora Mûşê derdikeve hemberî me. Li gor berhevkariya ku me li der û dora Mûşê kir piranî vê marê weha pênase dikin, "Ev mar ji ber mezinahiya xwe vê navê girtiye û dema marek ji aliyê emrê xwe ve zêde mezin bibe laşe marê jî beramberî emrê xwe mezin dibe û her weha ev mar dibe Ziha" (Hevpeyvîn: Sarıgül, 52). Ango em dikarin bejin ku ev mar wekî ku em ê di hevpeyvînên din de jî bibinin, wek ejderha jî tên pênase kirin. Ji ber vê taybetiya Marê Ziha ku wek ejderan jî tên binav kirin me jî xwest em bi marên din re bidin berhev û li ser arketîpa wî vekolin. Me xebata xwe bi taybetî li ser herêma Mûşê pêk anî ji ber vê tenê vebêjên Mûşê û vebêjên Çemê Muradê me wek sînor ji xwe re kifşe kir.

Her weha li gor erdnigariyan hin tayetiyên mar – ejderan diguhere. Wek mînak, teswîrên ejderhayên derveyî Avrupa tev bêbask hatine teswîr kirin û bi sînorên tûj ve marên baş û xerab ji hev du hatine veqetandin. Marê Ziha jî li hin deveran bi wesfên baş li hin deveran jî bi wesfên xerab hatine pênase kirin. Li gor vebêjên Mûşê û wek pênaseya Firdewsî tê gotin ku ji ber emrê xwe yê mezintir mar guheriye û bûye Ziha yan jî li gor vebêjên Milazgirê ku marek sed salan însanan nebînin dibin Ziha. Her weha Marê Ziha marekî pîr e û ji ber emrê xwe yê mezin laşê wî jî mezin dibe. Li devera Milazgirê dibe rawirê ava Çemê Muradê û di bin avê de dijî, di devera Gimgimê de dibe xwediyê avê û tev di qurtekî de ava Çemê Muradê vedixwe (Hevpeyvîn: Kocadağ, 25). Li gor vebêjên Kopê hin caran zilm û zordarî li gelê cihê ku li wir dijî dike (Hevpeyvîn: Adıgüzel,72) hin caran jî gel ji mezinahiya wî ditirse û bixwe zulmê li xwe dike (Hevpeyvîn: Dilêr Serhed, 27). Piştî van bûyerên bizirar û xetere Xweda bi zincîrekî ve Ziha girê dide û kaşê asîman dike ku êdî zirarê nede gel û ava çem jî bila di ser gel de here. Lewra Ziha bi gelemperî heya Çemê Muradê nemiçiqîne devê xwe ji avê dernaxe.

Li gor çavdêriya me piranî hebûna vî marî bi rêza Çemê Muradê re berdewam dike. Campbell (2015: 18) di vê mijarê de dibêje ku mar di heman demê de kaosê û avên kaotîk temsîl dike. Mar bi çanda avê re ji nêz ve têkildar in û di bin pehnavan de ji bo rêzikên gerdûnê tehdît in. Ev rêza Çema Muradê, felsefe û çanda avê tîne bîra me. Lewra av nîşaneya bereketê ye û li gor vebêjên Kopê dema ku Marekî Ziha hat kuştin divê ew bi darekî ve bê daliqandin. Lewra bi vê rîtuelê ve şilî dibare lê dema piştî kuştina wî, kesek mar bavêjê avê ew sal êdî ber lehî û tofanê nayê girtin. Her tişt bi avê re hildişê. Di berhevkariyên Kelereşê de ji bo Marê Ziha tê gotin ku dema ew li ku be bereketê dibe li wir lê ji ber ku gelek mezin bû xelk jê ditirsiyan û ji ber vê Xweda ew bir asîman. Ev mînak dualitiya maran nîşanê me dide, hem kaotîk in û xetere ne hem jî timsale bereketê û avê ne.

Li gor vebêjên Misirê dema ev mar derkeve asîman diçe bi Xwedayê başiyê re şer dike lê li gor vebêjên hin nêrînan dema hildikişe asîman diçe cem Xweda û ev jî dibe temsîla başiya wî marî (Erden, 2016: 59-65 ve Sayce, 2012). Dema Marê Ziha jî tê hilkişandin devera Milazgirê dibêjin ji ber xerabiya xwe hat ceza kirin, devera Kelereşê jî dibêjin Xweda ew bir qata xwe. Ev jî hem dibe tişteke baş û hem jî dibe tişteke nabaş her weha di vir de jî dualîtiya Ziha derdikeve holê.

Piştî van agahiyên derbarê taybetmendiyên Marê Ziha em dixwazin di mîtolojiyên din de jî behsa maran bikin û têkilî û hevpariyên wan bi Marê Ziha re derbixin holê. Lewra wek me di serî de jî vegot, li gor vê teoriya Jung binebîriyeke kolektîf ji bo vî ajalê mîtolojîk heye. Li gor erdnîgarî û vebêjan em ê niha çavdêriya taybetiyên ejderên din bikin.

## 2.2. Di Mîtolojiya Misirê De Mar

Wek piraniya medeniyetan, li Misirê jî mar wek aferîdeyên îlahî hatine binav kirin. Di heman demî de wek tîmsala welidînê û berdariyê dihatin hesibandin (Yöndemli, 2014: 17). Mar di van çîrokan de jî hin caran xwediyê taybetmendiyên baş in hin caran jî nebaş in. Wek vebêja ku di navbera Ra û İsisê de derbas dibe, ku İsis marek biefsûn diafirîne û dibêje tu yê herî navê Ra, ya biefsûn hîn bibî. Piştî hînbûna navê Ra İsis carek din marê dişîne. Di vir de li gor Erden (2016: 61) Ra temsîla nêrî û mar temsîla mêyî ye ku ev qise mînaka têkiliya di navbera wan ya bêdawî ye.

Her weha marên ku di vê mîtolojiyê de derdikeve hemberî me bi Çemê Nil ve jî tên girêdan. "Ew ruhê Nilê bû û Nil çema ku pê re diherikî û ev jî ejderhayê Nilê bû" (Mackenzie, 1996: 54). Wek li gor çavdêriyên me ku Marê Ziha çawa zêdetir bi Çemê Muradê re dihat bikar anîn div ir d jî heman têkilî derdikeve hemberî me. Bi têkiliya avê re mar dibû temsîla bereketê jî. Lewra dema laşe marê bavêjin avê êdî dawiya baranên bereketê nayê û tofan radibin. Heger ev mar dayik be di heman demî de dibû temsîla parêzeriyê (Mackenzie, 2015: 182). Ji xeynî van mar bi Xwedayê rojê ve jî tê temsîl kirin ku di taswîrekî de mar xwe li dora tavê dialîne û wek hevdîtina malzarok û sperma derdikeve holê. Navê vî marî Apep e û dujminê aferîdeyê tavê Ra ye û kuştina ejderha jî motîfek hevpar e ku zêde derdikeve hemberî me. Apep aferîdeyekî mar e û di bin erdê de, di tariyê de dijî. Wek ji rewşê jî kifşeye temsîla xerabiyê ye lewra jiyana binerd tarîtî û xirabiyê temsîl dike. Ev jî rewşa Marê Ziha ku di bin Çemê Muradê de dijî yan jî sed salî di bin erdê de dijî tîne bîra me. Helbet Ra di dawiyê de Apepî dikuje lewra Apep di gerdûnê de ji bo sîstema resen jî tehtîdek e (Erden, 2016: 59-65). Di ferhengê de jî wek marek gelek dirêj, xerab û aferîde tê pênase kirin (Larousse Semboller Sözlüğü, 2014: 45). Di vê mijarê de Hançerlioğlu jî di derbarê Apep de dibêje (2013: 48) "Marê ku li asîman dijî… ji bo ku bi Ra vede derdikeve asîman û rojekê jî digihîje armanca xwe." Di vir de jî rewşa ku Marê Ziha ber bi jor ve tê kaş kirin derdikeve hemberî me. Bi vê awayê Marê Ziha di heman demî de gelek dualitiyan jî di xwe de dihewîne, wek bereket û ziwahî yan jî baş û xerabî.

Her weha wek di vebêjên Çînê de jî yê derkeve hemberî me, ev dualitiya xerabî û başiyê di heman demî de dibe nîşaneya arketîpa dêyî.

Mar di tacên firewnan de wek sembola hêz û serkeftinê cih digirtin. Ev mar bi navê Uraeus li ser tacan dihatin xêz kirin. Maneyên nemiriyê û hêza bêdawî jî di xwe de dihewîne. Her weha sembola afirîneriyê ye (Duman, Sağır, 2018: 286-287). Ev Uraeus wek kobrayeke mê tê teswîr kirin û li gor van gotinan ji devê xwe jî agir davêje. Bi vê agirê hukûmdar diparêze (Varner, 2007: 124). Ne tenê ku Apep hildikişe asîmanan, her weha Ra jî dikeve bin erdê û li wir marên 4 – 6 pê ku serê wan însan e dibîne, kobrayên ku ji devê wan agir difure dibîne, marên wek bazan xwedî per û bask dibîne. Dawiya dawî ji destê maran xelas dibe û ji poça marê ve dikeve. Ji devê marê ve derdikeve rûyê erdê (Hart, 2012: 83-86).

### 2.3. Di Mîtolojiya Yewnanan De Mar

Mîtên di çanda Yewnanan de cih digre piranî dibin navenda çanda Yewnanan. Mîtên ewil ku hatine qeyd kirin beriya mîladê di serdemên 7 û 8an de, di helbestên Homeros û Hesiodos de hatine peyda kirin (Erden, 2016: 74). Ev mît tenê çand û wêje nîn in ji bo Yewnanan di heman demî de bûyerên dîrokî ne jî. Bi vê awayê ji mîtên miletên din jî jêgirteyan kirine û hildane nav vebêjên xwe. Her weha piştî vê tespîtê çîrokên hevpar derketine holê û bingeha mîtolojiyê hatiye avêtin.

Di vê mîtolojiyê de mar tê sê wateyan;

i. Bendewariya erdî dike.
ii. Têkiliya di navbera mirî û zindiyan de ye.
iii. Ji mirinê filitîn û berdewama dolê ye (Naskali, 2014: 20).

Ji van maran yek jî Ophione ku dev li poça xwe dike ev dibe temsîla ji nû ve jiyîn ê. Her weha dibe temsîla ejderha jî. Bi van temsîlan dibe hukûmdar û li ser rûyê cihanê xerabiyê temsîl dike. Li gor çîroka Ophion ev mar tevahiya xweza û cihanê afirandiye.

Ji xeynî vê Phyton jî temsîla ejderê dike. Dema Apollon Phytonî dikuje navê wî tê maneya dehla genî ku av di tê de miciqî ye (Can, 2014: 73). Ev kuştina Phytonî mînakek ji motîfa kuştina maran e. Piranî helwestên ejderan zêde xeternak û kaotîk in. Têkiliya wan û avê jî bi vê minasebetê bi hev re girêdayî ye. Ji ber vê yekî tên kuştin. Kuştina Marê Ziha kişandina wî ya asîmanan e lê ev kişandina asîmanan her dem nayê wateya xerabiyê lewra li gor vebêjên Misirê çûyîna asîman kuştin nîn e. her weha sedema kuştina Pythonî jî kaos e. Ev motîfa kuştina ejderhayê di vebêjên Heraklesê de jî derdikeve hemberî me. Herakles ji bo gunehê wî were afû kirin divê ejdera bi navê Lerna bikuje (Erden, 2016: 80). Bi van motif û dijberiyan ve mar di gelek çîrokên afirandinê wek Dehak derdikevin hemberî me. Lewra Kawa jî divê ji bo hin tiştan vî mêrê-mar bikuşta.

### 2.4. Di Mîtolojiya Çînî De Mar

Di mîtolojiya Çînî de mar hin caran jî wek ejderhayan derdikevin hemberî me. Wek di efsaneya Marê Ziha de, di çîrokên Çînî de jî marên ku zêde emir dikin pişt re dibin ejderha. Xwedî baskên şevşevokan in û çermê wan dibiriqe. Di Anatolya Navîn de ejderha wek marên xerab derdikevin hemberî me lê li Rojhilata Dûr ejderha wek ajalek pîroz tê dîtin û li asîman dijî. Sembola başî û bereketê ye. Heta di nav çanda Çîniyan de ji bo bext û şansê li ser van maran merasim tên çêkirin (Yılmaz, 2020). Çawa li Rojhilata Dûr ejder wek ajalên pîroz tên qebûl kirin li devera Kelereşê jî Marê Ziha pîroz û baş tê qebûl kirin.

Li gor pênaseya Çîniyan ev ejder xwediyê seriyekî hêştira ne, qiloçên xezalê nêr pê re hene, çavên wan wek rawiran e û pençeyên wan dişibin yê bazan. Li ser laşe wan 117 pul hene ji van 81 temsîla başiyê 36 temsîla xerabiyê ne (Esin, 2004: 5). Bi vî awayî tê dîtin ku ev ejder jî dualî ye û hem baş hem xerab e. Her weha dibe mînakek ji bo arketîpa dêyî.

Li gor vebêjên kevnare yên Çînî çar ejderhayên aferîde hene. Ji van yek ejderhayê asîmana (Tian Long), yê duyem ejderhayê xezîneyên veşartî (Fu Zang Long), yê sêyem hukûmdarê rêya avan (Di Long), yê çarem rêvebirê ba û şiliyê (Shen Long) ye. Pişt re du hebên ewil wek aferîde hatine nasîn û taybetmendiyek din jî ev e ku ejderên vê erdnigariyê bêbask hatine teswîr kirin (Yılmaz, 2020). Dema em Marê Ziha jî dinêrin ew jî bêbask e. Ji ber ku di hin deveran de ejderha timsale bereketê ye dema ev ejder diketin xew demên zehmettir derdiketin holê. Piştî xewa zivistanê ejder ji xew radibûn û têkoşîna di navbera aferîdeyan dest pê dikir. Ji ber vê şilî û bahoz dest pê dikirin û gel jî vê bûyerê bi seramoniyan pîroz dikirin (Aydın, 2013: 5). Ev ketina xewê em li dora Çemê Muradê jî dibînin, dema dibe zivistan Marê Ziha dikeve binê erdê û dema erd nerm dibe derdikeve holê. Li gor vebêjên Mûşê ji bo bereketê bide avê derdikeve li gor hin vebêjên din jî ji bo kaos û tirşe li ser gel bike derdikeve holê. Ango em div ir de jî dijberiyeke xurt dibînin wek ku ev mar bi xwe re jî têk here. Ejderên Çînî bi av, çem, û bereketê re di heman demî de bi tavê ve têkildar in (Aydın, 2013: 9). Her weha li gor çavdêriyên me Marê Ziha jî bi avê, bereketê, çem û bi sedema kişandina asîmanan ve bi tavê re têkildar e.

## 3. Di Mîtolojiya Cihanê De Lêkolîna Berhevdana Maran

Mar di her demî de hebûna xwe parastiye û bi mîtên afirandinê ve li erdnigariyan û çandan geriya ye. Hem ji ber jehra wî û hem jî ji ber mezinahiya wî gelek caran jê tirsiyane. Hem kujer e hem xelasker e û ev jî ji siruşta wî ya dualî tê. Ji ber van dualitiyan gelên ku bi maran re jiyane hem ji wan ditirsin hem jî rêzê ji wan re digrin.

Mar jî piranî di nav mîtên afirandinê û çandê de wek ajalek bizirar tê dîtin. Ev tirsa li gel maran bûye sedem ku însan wana wek aferîdeyan qebûl bikin. Di vê serenavê de jî em ê marê bi du awayan vekolin; yekem car taybetiyên aferîde binirxînin ku ev marên aferîde bi gelemperî çîrokên afirandinê de derdikevin hemberî me. Ya duyem em ê mar wek aferideyên xerabiyê ango wek şeytan binirxînin.

### 3.1. Wek Aferîde Mar

Hin caran mê hin caran nêr e ev arketip, lê gelemperî hêza maran bi hêza nêriyê ve tê girêdan. Têkiliya mar û welidînê jî ji têkiliya mar û xweliyê tê (Erden 2016: 86). Lewra xwelî wek cihê welidînê tê wesifandin û ji ber şeklê xwe jî mar wek spermayê tê dîtin û lihevzêdebûnê temsîl dike (Eliade, 2014: 260). Ji xeynî van mar hem xwe nû dike hem

jî xweliyê ji ber ku dikole û ser û binê hev dike, wê jî nû dike. Yöndemli (2006: 56) dibêje; ji ber vê esrar û gîzên maran, însan ji wan tirsiyane û bi baweriya ku ew aferîdene xwe ji xezeba wan parastine. Bi vê awayê aferîdeyên mar jî dibin xwedî qudret li ser însanan. Marên aferîde jî dîsa bi awayekî dualî derdikevin hemberî me; aferîde û kujer. Ev dişibe arketîpa dêyî ku li gor Jung arketîpa dê jî hem diparêze û jiyanê dide hem jî dikuje û xerab dike. Jung bi vê awayê xwelî, çem û avên biçûk wek cihên welidînê disenifîne. Avên kûr, ejderhayan jî wek tiştê bêyom dibîne. Hem arketîpa dê hem arketîpa mar di nav xwe de dualî ne (Jung, 2013: 44).

Di piraniya mîtolojî û efsaneyên cihanê de mar bi awayekî derdikevin hemberî me. Her weha di vebêjên gelerî yên Kurdî de jî xwe di hin çîrokan de dide nişan. Di hin efsaneyên Kurdî de dema erdhej çêbibe tê gotin ku "Dunya îsal li ser pişta gavmasiyê ye". Gavmasî wek marmasiyekî gelek mezin tê teswîr kirin. Her weha cihan hem bi mar hem bi masî û hem jî bi avê re têkilî datîne. Ev hêman taybetiyên arketîpa dêyî di xwe de dihewîne. Bi vê awayê Marê Ziha jî di hin deveran de wek ejder tê binav kirin û ejder jî temsîla kaos û avê ye, lewra wek ku tê vegotin ev ejderha di binê avê de dijî.

Hem di jiyana rasteqîn de hem jî di vebêjên gelerî de Marê Ziha di serdema baharê de derdikeve rûyê erdê, zivistanê di binê erdê de ye. Wek xwezayê mirî ye lê bi xwezayê re şiyar dibe û dîsa wek xwezayê ji bo dolgirtinê amade dibe. Di vir de jî wek dê tê xuyanê. Di çîroka mîtolojiya Enuma Elişê jî ejdera ku navê wê Tiamat e, aferîdeya gerdûnê û yezdanan e. Di heman demî de jî dixwaze cihanê xerab bike. Ji ber vê dualîtiyê dişibe atketîpa dê (Ali, Görgü, 2016). Di mîtolojiya Misirê de jî wisa ye. Di serdema medeniyeta aferîdeyan de jî ji 8 aferîdeyan 4 heb mar in. Ev aferîdeyên mar temsîla xerabiyê ne û mê ne. Di heman demî de temsîla zêdebûn û welidînê ne. Hermopolis jî yezdana afirandinê ye. Her weha Osiris jî bi Nilê ve hatiye girêdan û bûye temsîla çandiniyê. Marê Ziha jî piranî bi rêza Çemê Muradê ve derdikeve hemberî me û dibe temsîla av û çandiniyê. Di heman demî de Osiris temsîla bereketê ya gerdûnî ye (Eliade, 2012: 125).

Di mîtolojiya Yewnanî de jî Ophion tişta ku afirandinê daye dest pê kirin e (Erden, 2016: 90). Her weha di mîtolojiya Çînî de Tion Long ejderhayê asîman e ku wek Marê Ziha li asîman dijî, Di Long hukûmdarê rêya avan e û wek Ziha çawa piranî li ser Çemê Muradê tê dîtin û hukmê li ava Muradê dike, ev ejder jî wisa ye, Shen Long jî rêvebirê ba û şiliyê ye û Ziha jî bi av û şiliyê ve ber bi jor ve tê kişandin.

### 3.2. Wek Şeytan Mar

Mar, wek me di serenava jor de jî dît her çi qas temsîla arketîpa dê be, xwediyê bereket û başiyê be jî di heman demî de temsîla xerabî û nebaşiyê ye jî. Lewra mar dualî ye. Me hin wesfên baş nirxandin di vir de jî em ê li ser hin taybetiyên wan ên nebaş bisekinin. Di *Ferhenga Sembolên Mîtolojîk* (*Mitolojik Semboller Sözlüğü*) weha derbas dibe;

"Di destana Akadan ya Gilgamêşê de; tişta ku kete pey şopa nebata nemiriyê û derkete rêwîtiyeke dûr, mar bû. Di baweriya Xrîstiyanan de mar temsîla şeytan e. Lewra Hawa ji rê derdixe" (Larousse Semboller Sözlüğü, 652). Ew dara sêvê (yan jî fêkiyeke din) her çi qas jiyaneke nû temsîl bike jî, mar di vir de temsîla xapandinê ye. Di piraniya vebêjan de ev arketîp dujminê tavê û başiyê ye. Ji ber vê her dem bi ronahî û yan jî bi temsîla wî re dikeve têkoşînê. Wek; Zeus Typhon, Osiris – Set, mar – baz. Her dem di van şeran de jî têk diçe. Jixwe divê têk here lewra dema ew mar bên kuştin pêvajoyek nû û baştir ava dibe. Lê dijî vê tiştê di vebêjeke gundê Milazgirê Elîbonciya de baz û mar dikevin nav têkoşînê lê baz têk diçe. Ev jî nîşan dide ku mar di vê çîrokê de dijî gelemperîyê roleke baş werdigre. Di hin vebêjên Marê Ziha de jî wek ajalek xerab tên gotin.

Ew qas mezin in ku "Ji ber mezinahiya xwe heywanek têr naxwe û venaxwe ye. Ji ber vê, keriyên pezan tev bi qurtekî de dadiqultîne û ava Çemê Muradê di carekî de vedixwe." (Fahriye Ayan, 69). Wek me got ev marên xerab tev bi ronahî û başiyê re têdikoşin, di vebêjên ku ji Milazgirê hatin berhevkirin argumanek weha derket hemberî me; "Ziha piştî ku zêde mezin dibe ji jor ve zincîrek berjêr dibe û li stûyê Ziha diale û wî dikişinin zor. Di vir de em dibînin ku Marê Ziha ji aliyê quwetekî asimanî tê girtin. Her weha em dikarin bejin ku Marê Ziha jî tê bindest kirin û di şerê tarî û ronahiyê de têdikoşe.

Di mîtolojiya Misirê de jî Apopîs ango Apep bi taybetiyên şeytanî ve tê zanîn. Dikeve pey Ra û dixwaze wî bikuje û di temsîla wî de rojê û ronahiyê bikuje. Lê tu car nagihîje armanca xwe û arketîpa şeytanî derdikeve holê.

Di mîtolojiya Yewnanan de jî Typhon temsîla marê şeytan û ba û bahozê ye. Serî li Zeus digre û Zeus jî wî ji bo cezakirinê dişÎne binê erdê. Python jî bi Apollon re tê dîtin. Apollon jî Python dikuje ji ber ku însanan ditirsîne û wan aciz dike. Di dawî de her du mar jî tên kuştin û bi avê re tên girêdan. Typhon dibe ajalekî ku di bin pehnavan de dijî. Python jî dibe çemen di bin geliyan re tê (Erden, 2016: 95). Ejdera din Lerna ye ku li gor vebêjekî dibêje dema sere Lerna ji aliyê Herakles ve dihat jê kirin dîsa ji nû ve şîn dibû. Ji ber vê jî Herakles cihê seriya jêkirî dax kir ku caarek din şîn nebe. Ev jî temsîla arketipiya dê ye ku xwediyê taybetiyên xerab e.

## 4. Encam

Me di vê gotarê de berhevdanek li ser mîtolojiyên Kurdan ya herêma Mûşê, ya Yewnani Çîn û Îranê kir. Me vê berhevdanê li gor rêzikên Carl G. Jung ya arketîpî kir. Felsefe çîroknasî, dîrok û wêje çi qas têkildarê hev bin û ji hev sûd bigrin jî têkiliya wan bi qasê wêje û mîtolojî nîn e. Lewra vebêjên mitolojik wek tekstên wêjeyê ya yekem tên hesibandin. Ji ber vê her wêjekar, helbestvan û hunermend dema van çîrokan gihandiye vê rojê, di heman demê de van çand û mîtan jî digihîne roja me.

Tiştek ku me dest xist jî ev mît, her çi qas di erdnîgariyên cuda de derketibin holê jî taybetiyên wan hevpar in. Ev gotar jî di mîtolojiyên cuda de taybetiyên hevpar şîrove kir. Lewra mîtolojiya berhevkarî di navbera çandan de ragihandinê ava dike. Bi vê awayê mîtolojî wek pirekî di nav çand û gelan de hevgirêdanek pêk tîne.

Me dît ku Marê Ziha bi van her sê mîtolojiyên maran ve, Îran – Çîn – Yewnan, ji gelek aliyan ve têkildar e. Hem bi arketîpiya dê û hem jî bi taybetiyên xwe yên baş û nebaş ve derdikeve hemberî me. Gelek varyantên vê çîrokê hatin nirxandin û li ser dualitiya Marê Ziha hat sekinîn. Ji gelek aliyan ve çîrokên Marê Ziha bi mîtolojiya van gelan re têkildar e. Hem bi varyantên arketîpên baş û hem jî yên nebaş di çîrokên Marê Ziha de hat dîtin. Ji xeynî efsaneyan

em dikarin çîroka Marê Ziha wek vebêjek mîtolojîk jî bibînin.

Dema lêkolîna maran me hilda dest cara yekem me behsa vebêjên Kurdan kirin. Gelek varyasyonên maran derketin hemberî me û di şeklen cur bi cur de, xwedî taybetiyên cuda de derketin hemberî me. Pişt re vebêjên Marê Ziha hatin nirxandin û me dît ku vebêjên Marê Ziha ku li herêma Mûşê hatin berhev kirin, gelek caran wek ejder jî tên bi nav kirin.

Hem di bin erdê de hem li asîman dijîn ev mar û her weha dualitiya hevpar derdikeve holê. Binê redê wek temsîla xirabiyê asîman jî wek temsîla ji nû ve zayînê tê dîtin. Mar jî ji demên bere heya niha her tim wek ajalek layiqê rêzê û xeternak hatiye hesibandin, her weha hem xwediyê zehr e û hem jî xwediyê şifayê ye.

Her weha bi "ji nû ve zayinê" re jî têkildar hatiye dîtin lewra hem ji ber şeklê xwe şibiyaye spermayê hem jî bi av, dar û şiliyê re hatiye vegotin û ev jî li ser rûyê erdê temsîla zêdebûn û bereketê ne.

Her weha di van mîtên ku me dan berhev de; mar hem wek mê xwedî taybetiya zêdebûnê ye û hem jî wek nêr xwedî tahakumê ye. Ji ber vê mijara afirandinê û kaosa gerdûnê di xwe de dihewîne. Ji ber hevpariya arketîpa dayik û marê temsîla têkoşîna bêdawî û zindayetî-mirinê dide nîşanê me. Kuştin û saxiya mar têkoşîna mê û nêr temsîl dike ji ber vê jiyana cîhanê ya rojane temsîl dike. Ji ber guherîna cermê xwe jî dibe temsîla jiyaneke û emreke bêdawî.

Bi van hevpariyan ve em dibinin ku Marê Ziha xwediyê taybetiyên mîtên cihanê ye, ji ber vê em dikarin bêjin ku ew jî yek ji mîtên cihanê ye.

## Çavkanî


Aydın, Ö. (2013). "Çin ve Türk İşlemelerinde Ejderha Motifleri" Akdeniz Sanat Dergisi cilt: 6, sayı:12, ss: 1-12.

Aydunlu, S (2011). *Firdevsi'nin Şehname'sinde Kürtler.* İstanbul: Avesta Yayınları.

Boratav, Pertev N. (2012). *Türk Mitolojisi*, (Çev): Recep Özbay, Ankara: Bilgesu Yayınları.

Campbell, J. (2015a). *Batı Mitolojisi,* Çev: Kudret Eminoğlu, İstanbul: Islık Yayınları.

Can, Ş. (2014). *Klasik Yunan Mitolojisi,* Ötüken Ankara: Neşriyat Yayınları.

Çekici, M. (2019). "Pers Mitolojisi ve Despotizm Sembolü Zahhâk". *Akademik Tarih ve Düşünce Dergisi* Cilt 6, Sayı 3, ss 1323-1339 Erişim Tarihi:09.01.

Duman, H. Sağır, T. (2018). "Antik Dönem Medeniyet ve İnançlarında Ejderha ve Tanrı İlişkileri Üzerine Bir Değerlendirme". Uluslararası Araştırmalar Dergisi. Cilt 11, Sayı 58, ss 278-291.

Eliade, M. (2014a). *Dinler Tarihine Giriş,* Cilt 1, (Çev): Lale Aslan Özcan, İstanbul: Kabalcı Yayınevi.

Eliade, M. (2012). *Dinsel İnançlar ve Düşünceler Tarihi*, (Çev): Ali Berktay, İstanbul: Kabalcı Yayınevi.

Erden, C. (2016). Dünya Mitlerinde Yılan (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Eskişehir Osmanazi Üniversitesi SBE.

*Etimoloji* Türkçe Online sözlük, https://www.etimolojiturkce.com/kelime/ejderha, Erişim Trihi: 13.12.2020.

Hançerlioğlu, O. (2013). *Dünya İnançları Sözlüğü*, İstanbul: Remzi Kitabevi.

Hart, G. (2012). *Mısır Mitleri*, Çev: Mehmet Sait Türk, Ankara: Phoenix Yayınları.

İrde H. Y. (30.04.2019). Ejderha Nereden Geliyor, http://nerdengeliyo.com/ejderha/, Erişim Tarihi: 13.12.2020.

Jung, Carl Gustav. (2006). Analitik Psikoloji. (Çev): Ender Gürol, 2. Baskı, Payel Yayınları, İstanbul.

Jung, C. G. (2013b). *Dört Arketip,* (Çev): Zehra Aksu Yılmazer, İstanbul: Metis Yayınları.

Mackenzie, D.A. (1996). *Çin ve Japon Mtolojisi,* (Çev): Koray Akten, Ankara: İmge Kitabevi.

Naskali, E. G. (ed). (2014). Yılan Kitabı, İstanbul: Kitabevi Yayınlar.

Pala, İ, (2004) *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları.

Pejmân, F, S. Ve Semedî, M. (2016). *Berresi-i Mefhum-i İnkılâb der Dâstân-i Zahhâk bâ Nezeriye-yi Goldemen,* faslnâme-yi Tehessus-i Tehlil u Negd-i Motûn-i Zebân u Edebiyât-i Farsî, Şomâre 28 (Tâbistân 1395/2016): 149.

Sayce, A. H. (2018). *Antik Mısır ve Babil Tanrıları.* İzmir: Lilith Yayınları.

Öncü, M. (2014). *Çîrokên Efsaneyî Yên Kurdan.* İstanbul: Pak Ajans Yayıncılık.

Vamer, G. R (2007). Creatures in the Mist: Little People, Wild Men and Spirit Beings Around the World: A Study in Comparative Mythology, Algora Publishing, USA.

Yördemli, F. (2004). *Tarih Öncesinden Günümüze Yılan*, Ankara Piramit Yayıncılık.

Yılmaz, K. K. (28.04.2020) https://kubrakucukyilmaz.wordpress.com/ogeler/cin-mitolojisi/, Erişim Tarihi: 03.09.2020.

**Derleme Kaynakları:**

Adnan Adıgüzel, (Çiftçi – 72) "Marê Ziha yê li Kopê Hat Dîtin" Konulu ropörtaj, Bulanık/Muş. 19.08.2020.

Derya Kocadağ, (Öğretmen – 25)"Marê Ziha" Konuu ropörtaj, Varto/Muş. 19.08.2020.

Derya Kocadağ, (Öğretmen-25) "Marê Ziha" Konulu ropörtaj, Varto/Muş.

Dilêr Serhed, (Öğrenci – 27) "Taybetiyên Marê Ziha" Konulu ropörtaj, Diyadin/Ağrı. 21.08.2020.

Fahriye Ayan, (Ev hanımı – 69) "Taybetiyên Marê Ziha" Konulu ropörtaj, Malazgirt/Muş. 20.08.2020.

Sarıgül Mehmet Sefa, (İmam – 52) "Marê Ziha li gor vebêjan çi ye?" Bulanık/Muş. 20.08.2020.